
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (143) Sal 24 14ê Avdarê 2020 z - 2631 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Kurd ne şerxwaz in Kurd mirovhez û aştîxwaz in


Serê Kaniyê


Efrîn

**Desteya sernivîser**

Berî niha û îro jî, her dema ku pirsa Kurdî gavekê pêşve çûye, çirûskên ronahiyê dîtiye, berpirsên dewletên ku Kurd û welatê xwe Kurdistan li wan dabeşkirî ne, har û dîn bûne, û mîna gurên devbixwîn tevgeriyane, bi hev re pilanên tepeserkirin, qirkirin û kuştina Kurdan weke her car danîne, ev gelê bê sûc û bê guneh bi agirê zikreşî û kîna xwe ya reş sotine, ew di nava golên xwînê de hiştine!, bi hovîtî û xinizî, serok û rêberên Kurd ên canfîda kuştine. Di vî warî de, mînak pir û bê hejmar in, lê mirov dikare navên hin rêberên leheng di bîra xwe de bîne, li jêr rêz bike, mîna: Şêx Seîdê Pîran û hevalên wî, Simkoyê Şikakî, Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, hewldanên Kuştina nemir Mustefa Barzanî, Dr.Qasimlo û Şerefkendî, ji bilî kerx û kuştarên hovane yên derbarê gelê me birêve çûne, mîna Kuştara Helebçe, Geliyê Zîlan, Aleqemş, Dêrsim û Cirnikê...HWD.

Dema rapirsîna serxwebûnê li Başûrê Kurdistanê hate pê, her çar aliyan bi hev re civînên ewlehiyê yên hevbeş lidar xistin, bi dijwarî şerê Kurdan kirin, deverên Kurdistanî ku pêşmergeyan bi xwîna dilên xwe ji rêxistina Daişê rizgar kiribûn digel Kerkûkê, di siha kerrbûn û bêdengiya hemû cîhanê de, ..... ❷

# 21ê Sibatê (Reşmehê), Roja Cîhanî ya zimanê Dê

**Desteya NEWROZê**

Li cîhana me ya îro bêtir ji 7000 zimanî dijîn, lê mixabin ji ber egerên cuda ku sitem, çavsorî û rikgîriya nijadî ji hêlekê ve, û pirsa gilobalizmê ji hêleke din ve, pir ziman ber qelsbûn û wendabûnê ve diçin!.

Gelek pispor û zanyarên itnolojiyê, zimanzan û civaknas tekez dikin ku bi wendabûna zimanekî, dîrok, tore û kultûra miletekî ku bi sedê salan hatiye ser hev û cih girtiye winda dibe, ewqas zaniyarî û ezmûnên dirêj bi xwerist û jiyanê re ku ew ji kultûra cîhanî re semyan û dewlemndî ye, wenda dibe û ji dest diçe, ji cîhanê bi tevayî re ziyan û xemgînî ye.




Sazbûn û rûniştina zimanekî ne karekî hêsan e, lê belê ew encama pêwistiyên jiyanê hatiye pê, durva xwe ya dawî wergirtiye, bi demê re xwe diguhêre, xwe ..... ❹

# Dijmin nabe dost

**Nazdar Hesen**

Bêguman, em tev dizanin dijitiya dewleta Turk bi gelê Kurd re dijitiyeke dêrîn û berdewam e, ne ji rojekê û dudiyan ve hatiye, ew di dirêjiya dîrokê de her tim hewl dida Kurdan qir, bin ax û tune bike û wan ji gelên bîrçûyî û windayî bike. Belê dewleta Turk her tim hebûna xwe di tunebûn û qirkirina Kurdan de dibîne, û neyartiya wê ne bi partiyek kurdî yan bi hêzên parastina gel ên li Bakurî Rojhilatî Sûriyê ( YPG – YPJ – QSD ) re ne, û bi gotina wê: «Ger Kurd ji xwe re konekî li Efrîqayê vegirin, emê li dijî wî bisekinin û ji bin de hilweşînin» bêtir sextekariya xwe zelal û aşkere dike, û vê dijmantiyê dupat dike, û bi dagirkirina wê bajarê Efrînê hinde ji kelîna kîn, nijadî û çavsoriya wê ji serkeftinên Kurdan li hember hêzên terorîst û radîkal derdixîne, û diyartir dibe ku ev ceng û şer ne ji bo sînorên xwe biparêze an eger hêzên me zû vekşiya ev ceng ne diqewimî, na ev ceng cengek pîlankirî bû û pîlanên wê yên serek e ji bo dehadin û herfandina miletê me bû, û guhartina heyama wê ya civakî û bicihkirina biyaniyan û çeteyan li cih warên wê û belavkirina



ramanên xwe yên olperest û radîkal û serdema dewleta xwe ya osmanî vegerîne.

Ji ber vê yekê jî her ku dem di ser dagirkirina Efrînê re derbas dibe nexweşî û birînên kûr û bê derman di hiş û canê civaka efrînî de peyda û belav dibin, û wê civakê dixe tehlûkiyek bê dawî. Belê dijmin her dimîne dijmin û çendî bi diroşmên demokras, wekhevî û biratiyê xwe bixemlîne, ew nayên guhartin û wek bapîr û dapîrên me digotin: «Qijik nabin bilbil û eger rih jî bibe bost tu carî dijmin nabe dost».

---

**Kurd ne ... Dûmahîk**

ji destê Kurdan derxistin, û dest bi pirojeya erebkirina Kerkûk û gundewarê wê kirin!... Herweha, dema li Rojavayê Kurdistanê benê sitemkariyê li stuyê Kurdan hinekî sist bû, û piştî dana bêtir ji 11000 pakrewanî di şerên dij terorê de, gelê Kurd û pêkhateyên din ên herêmê bi aştî û aramî bi hev re jiyan kirin, careke din qîma wan nehat û şerê gelê Kurd ji xwe re kirin armanc, rabû Turkiyê Efrîn, Girê Sipî û Serê kaniyê dagir kirin, bi tundî û awayên hovane, dest bi guhertina dêmografî ya deverên Kurdî kir. Efrîna ku rêjeya Kurdan lê 97% bû, îro daketiye 25%!!...

Da ku neyarên hebûna Kurdan rastiya armancên xwe yên ne mirovane veşêrin, raya giştî ya cîhanê bixapînin, ew Kurdan bi terorê tometbar dikin. Lê, ev vir û derew nema dikarin kesekî bixapînin, her kes îde dizane ku Kurd ne şerxwaz in, lê belê ew mirovhez û aştîxwaz in.

Dûrî hûrguliyên siyasetê û şax û paxên wê, ew siyaseta ku mixabin îro çewt digere, pêwiste em vê bûyera dîrokî ya piçûk di bîra xwe de bînin: Piştî têkçûna serhildana Agrî 1930 li Bakurê Kurdistanê ser destê dewletên Turkiyê û Îranê, sergermên faşist ên dewleta Turkiyê li ser çiyayê Agirî gornek çêkirin, û li ser kêla wê gotinek bi vê wateyê nivîsandin: «Kurdistan li vê derê hatiye veşartin!.»...Ango, ew tiştа ku bi navê Kurdistan hebû, îro nema ye, ew mirî ye, di vê gorê de cîwar bûye!.

Belê…Şovenên sergerm li her cihî mîna hev diramin, tu dibêjî qey ew ji yek cawî hatine birrîn. Ew ji bîr dikin ku çerxa felekê dê ne li gora dil û xwesteka wan bigere. Xediyên vê nivîsê nizanin ku bav û kalên me Kurdan ji mêj ve gotine:»Geya di bin keviran de namîne». Ew nizanin ku ew kêla derewîn dê tu carî nebe rastî, û heta Kurd li ser xaka bav û kalên xwe bijîn, doza wan sax e, namire, û her dê ew ê çareseriyê bixwaze!.. Bila zanibin welatê Kurdan ne malê mîrate, bêxwedî ye ku xelk wî li xwe parve bikin, ji xwe re bibin, li hev par bikin!.

Ji ber nakokiyên rêzanî û aborî di navbera hêzên mezin ên cîhan ê de, dibe ku îro, sibe ev rijêmên tixumperest ta demekê serdest bimînin, berdewamiyê di xwarina welat û mafên Kurdan de bikin, lê dûrî aqila ye, û ne pêkane ku 45 miloyon Kurd ku li ser xaka bav û kalên xwe dijîn, bindest û bê maf bimînin!. Bêgomane, dê rojek were, Kurd jî çarenûsa xwe bidest bêxin, azad, serbest û bi rûmet bijîn.

# Da ku em xwe wenda nekin û wenda nebin

**Memê Alan**

Weke em tev dizanin kirîz û şerê navxweyî li Sûriyê hindik ma ku bibe neh sal û hîn tu çareseriyên siyasî di asoyê de nayêne xuyakirin.Ne tenê weha, her diçe kirîz dikufite ser hev,şer fere, hêgin û derbasî qonaxeke nû û metirsîdartir dibe, bi taybetî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û herêmên me yên kurdî. Ev şerê li dar, ne tenê şerekî di nav rijîm û rikberiyê de ye, na, ew di nav dewletên zûlhêz de ye jî ,lê mixabin bi destên xelkê Sûriyê û hin hêzên terorîst û radîkal ên Islamî yên ku ji pir welatan di Sûriyê de hatine komkirin de ye.Yanê em kanin bibêjin tabloya heye, gelek reş û şebeq e,jihevderxistina wê zehmet e , dawî çawa û kînga ye ne zelal e û viyana çareseriyê li ba hemî aliyên nakokdar tune ye,ji ber ku her aliyek dixwaze berjewendiyên xwe li ser hesabê gelê Sûriyê û em Kurd jî di nav de bi cih wîne û yê din tune bike.

Yanê zor kifşe ku aliyên sûrî yên nakokdar bûne lîstika dewletên destêwerdayî di hundir Sûriyê de û bê biryar û neçar mane.Vêca, di vê rewşa tarî û kirêt de, pirsa herî girîng ku ji me Kurdan tê xwestin ku li bersivê bigerin ew e, gerek em çi bikin da ku em kanibin ziyana xwe hindik bikin, di çareserkirina siyasî de xwedî rol bin û ji bo çarenûsa doza xwe ya dadmend, destkeftiyine zagonî û destûrî di pêşerojê de bi dest bixin?. Divê em ji bîr nekin, ku gelek rik li pêş me hene...Ji alîkî ve ,Turkiyê bi her awî û bi hemî hêza xwe hewil dide ku me tune bike û ji holê rake. Şam dixwaze bê ku




bi te û doza te mikûr bike, tu xwe radestê bikî, û Îran jî li hezê tê ku tu destvala derkevî. Amerîk û Rûsiya jî tenê berjewendiyên xwe zanin, berjewendiya wan jî bêtirî te bi Turkiyê,Îran û şamê re ye,yanê li dawiyê gengaz e, ku berî wan di te bibhorin.!

Yanê bijarte li pêş me Kurdan ne pir in û yên hene jî ,em jê ne piştrast in. Li hember van hevrikiyên li pêş me û bi tirs, em bi kû ve herin û kû ve çekin, bijarteyek heye bi sûde ye, gerek heya ji me heye em li ser kar bikin û bi cih wînin, ji ber ku bicihanîna wê tenê ji me re piştrastbûne....ew jî danheva hundir mala kurdî û yekirina gotarê û baweriya me hêzên me YPG,YPJ û QSD û guftûgo bi Şamê re ye ....Belkîm hinek ji me bêhêvî bûbin, hinek jî ji bo hin berjewendiyên xwe yên teng nexwazibin... Bawer bikin rast e zehmetî gelek in û belkîm em nikanibin yekderb jî wê hêviyê bikin rastî... Lê, ger viyan û dilsozî li ba me hebe, ewê pile..pile pêk were.

# Bîrvejîn

**Mihemed Qere Hesen**

Wê rojê li bajarê Helebê di şarêya Baron re digizdirîm, çavên min li qarima yekîtiya niviskarên Ereb, şaxa Heleb ket, vê bîranînên rojên berê bi vejandin, ku çiqas li simîner û şevbuhêrkên wê beşdar bûme, û ew dostên em bi hev re rûdiniştin û daxêvîn. Bê hemdê xwe di derecan re hilkişîm. Bê ku li derî xînim, li ser piştê vekirî bû, derbasê bûm, tu kes li hole û odên wê tune bûn. Min bi dengekî dudiyan bankir, dengê mirovekî li paş sekretona pirtûkan hat û jê bi derket û pêşwaziya min kir û bi destên bi toz silav da min û ez birim oda rûniştinê. Lê mixabin ji min e ez derbaz axirekî bi toz û malkên pilindir li koşên wê yên bilind girtibûn, ji te ye kavilekî mirov ji sed salî ve derbasê nebûye. Piştî em bi rewş û tentîlên hev pirsîn. Min xwe wek Kurdekî bi zimanê kurdî dinivise pê danasîn. Wî jî xwe weke helbestvanekî û serwerê pitûkxana yekîtiyê danasîn. Wî ji min pirs kir: Tu çima bi zimanê erebî nanivisîne ? Min jî bersivandê: Ez ji dê û bavên xwe bûm, û fêrî zimanê wan bûm, wê jî berpisiyariya nivîsandina bi zimanê wan hilda ser milê min. Ew helbestvana piçekê bi ser xwe de ponijî û xazî daqirtand û bê bersiva ma. Dostên min ji Kurdên Îraqê hene û bi zimanê erebî dinivisin, tu çima li Sûriyê bi kurdî dinivisî ? Min bersivandê: Gava em jî Kurdên Sûriyê wek ên Kurdistana Îraqê mafên xwe destûrî werbigirin, û yekîtiya niviskarên Kurd damezerînin, wê Kurdên bi erebî dinivisînin ji we û kesên bi erebî zanin berhemên di rêya şevbihêrk û simîneran ji we re bi xwînin. Wî helbestvanî carek din ponijî û xazî daqirtand. Û li paşiyê got: Zimanê erebî yê bihiştêye, li wê jiyanê em tev dê pê bixafin. Min gotê: Mamoste em niha jîndar in ne mirîne, de niha em her .....

4

**Bervînjîn ... Dûmahîk**

netewek bi zimanê xwe fêr bibe binivise û pê zanînê biberhimîne... Hê em di axaftinê de ne, mirovekî temenê xwe kêmtirî sih salî derbas odê bû, û xwe wiha danasîn. Ez bavê filanim ji asayîşa konevanî me. Dixwezim serokê yekîtiyê bibînim, ji ber ku em lêkolînê li ser dikin.

Edresa serwerê yekîtiyê bir û rabû çû. Di paş re helbestvan ne vehesiya xwe bi çend pirsan xuya kir. Ez jî bê ku bipeyivim, min xatirê xwe jê xwest û bi derketim.

Di pê re min çend pirs ji xwe kirin. Çiqas kar û cefa bi rewşebîrên Kurdan gerek in, ku dademendiya mafên Kurd bi rewşenbîrê ereb bide nasîn, ta hişê hevjina hevbeş di serê wan de cih bigre?. Ta kîngê ev rijîma dê zana û rewşenbîran rêzbigire?

# Pîrozbahî

**Ji heval û hogirên Yekîtî Niştîmanî Kurdistan ya bira re...**

**Silav û rêz...**

Helbijartina herdu berêzan Lahor Şêx Cengî û Bafil Talbanî bona hevserokatiya YNK piştî serkeftina lidarxistina kongireya giştî, ciyê pîrozbahiya partiya me ye.

Bêguman, xebat û têkoşîna Yekîtî Niştîmanî Kurdistan û berevanî di ber berjewendiyên xelkî herêmî Kurdistan bi taybetî




û xelkî Îraq bi gelemperî, rolekî berz û dîrokî ye.

Careke dî em we pîroz dikin û bêtir gavên serkeftî ji we re dixwazin.

Digel ciwantirîn silavan
20.02.2020an

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Allî**
**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

**21 Sibatê ... Dûmahîk**

nû dike û pêşve diçe. Ango, ziman mîna her jîndarekî li vê gerdûnê ye, da ku zindî bimîne, ew peyv û bilêvkirina bêjeyan li gora dem û rewşa jiyanê sivik dike, diguhêre.

Gelo çima roja 21 Sibatê (Reşmehê) bû Roja Cîhanî ya Zimanê Dê?.

Beriya ku di Avdara sala 1971an de gelê Bengalî bibe xwedî dewleteke serbixwe, ew di çarçewa dewleta Pakistanê de dijî. Li roja 21ê Avdara sala 1948an, Mihemed Elî Cenah ê ku destelatdarê giştî yê Pakistanê bû, di civîneke cemawerî de, biryar da ku zimanê Ordo bibe zimanê fermî yê dewletê, bê ku tu rêz û rûmetê bide zimanê Bengalî ku ew zimanê piraniya xelkên rojhilatê welêt bû. Gelê Bengalî, bi comerdî, bi hevgirtina hemû qat û pêkhateyên xwe berevanî di ber nasnameya xwe ya netewî de kir, û li dij vê biryara nijadperest û sitembar serî hilda, bi nave «Tevgera zimanî ya Bengalî» serhildan û xwepêşandanên mezin birêve birin.

Li roja 21ê Sibatê (Reşmeha) sala 1952an, di xwepêşandaneke mezin a xwendekarên zanîngeha Dakka yê de, asayîşa dewletê ew xwepêşandana aştiyane gulebaran kir, di encam de, 5 xwendekar hatin kuşitn!...Piştî vê bûyera xwînî, xeleka xwepêşandanên gel berfirehtir bûn û xaka bin lingê rijêma dîktator M.E.Cenah hejandin... Paşê ew neçar bû ku biryara xwe biguhêre, zimanê Bengalî jî li kêleka zimanê Ordo bibe zimanê fermî yê dewletê. Hikûmetê ji pakrewanên wê rojê re, li zanîngeha Dakka yê peykerek bi navê şehîd Minar ava kir.

Li ser destpêşxeriya dewleta Bengladişê, sala 1999an, rêxistina UNESCO yê ev roj mîna **«Roja Cîhanî ya Zimanê Dê»** bi nav kiriye.

Li devera me ya Rojhilata Navîn îro derdora 45 milyon Kurd li ser xaka welatê xwe, di nav sînorên çar dewletan de (Turkiyê, Îraq, Îran û Sûriyê) de dijîn, li ser destê rijêmên van dewletan, ew toşî siyaseteke pilankirî a tunekirinê dibin. Ziman, folklor, zargotin û nasnameya Kurdî qedexe ye. Û bi armanca pişaftina gelê Kurd û tunekirina zimanê wî, bi her hawî, bi dijwarî şerê wî dibe. Zarokên wî, bi zimanê netewa serdest dixwînin û perwerde dibin, helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên Kurd ji bo belavkirina berhemên xwe yên bi zimanê Kurdî têne girtin û hin jî têne kuştin ku şehîd Mûsa Enter yek ji wan e... HWD.

Herweha li bakurê kişwera Afrîqayê jî gelê Amazîg ku bêtir ji 35 milyon mirov in, nişteciyên resen ên welêt in, beriya ku bi navê ola Islamê Ereb welatê wan dagîr bikin, ew ji hemû mafên xwe yên netewî bêpar in, ziman û nasnameya wan qedexe ye, û li ser destê dewletên deverê bi çavsorî têne tepeserkirin û mafên wan têne daqurtandin!.

Ji bo parastina pirengiya netewî, olî û çandî, ji bo belavkirina çanda nûjen a aştî û mirovheziyê, ji bo bihevrejiyana hemû gelên cîhanî dûrî kîn, zikreşî û nijadperestiyê û avakirina cîhaneke xweş ji hemû gelan re, pêwiste rêxistina navnetewî UN bi hemû hêza xwe zimanê hûrgel û kêmnetewan ji winadabûnê biparêze, rê li ber pişaftina gel û zimanan bigre, da ku di baxçeyê ziman, wêje û kultûra navnetewî de, hemû reng bêne dîtin û parastin.

***«Roja Cîhanî ya Zimanê Dê» li hemû gelên cîhanê pîroz be!.***

# Hin xalên giring Ji nameyeke min bo dostekî

**Newafê Bişar**



…. Di vê nameya xwe de, ez dixwazim hin nerîn, bîrbawerî û xemên dilê xwe, li ser gelek rewş û bûyerên ku vê dawiyê li devera me rû dane bi te re parve bikim.

Tişta herî balkêş li ser asta cîhanê ew e ku îro ademîzadî di xaçerêk, serdem û qonaxeke metirsîdar re derbas dibe, ji ber ku siyasetmedar û navendên çêkirina biryarên stratîjîk ên dewletên mezin ên cîhanê, yên mîna Emerîka, Rûsiya û Yekîtiya Ewropayê, berjewendiyên welatên xwe yên aborî danîne pêşiya hemî nirxên mirovatî, mafên mirov, belgeyên rêxistina navnetewî û parastina jîn û jîngehê, ew a ku em hemû, çi piçûk, çi mezin, hevparên wê ne.

Ji ber vê yekê jî, ango ji bo bidestxistina destkeftiyan û zeftkirina gepên xweş û mezin ji samana gelên piçûk, nakokî di navbera hêzên mezin de derketine, zarziman û gotara hişk û tundtûjiyê hawîr belav bûye, hêzên tariyê geş bûne... Lê, ya ji hemiyan xirabtir jî ew e ku rêxistina navnetewî (Yekîtiya Netewan) bûye qurbana van nakokiyan ku mixabin îro ew nikare yek biryarê beramber bûyereke mezin a navdewletî werbigre, yan bi yek dengî ew li hember dewleteke çavsor a zorker biryarekê bistîne!.

Her kes dizane ku ti civak, çi ya mirovan, çi ya lawiran be, ew nikare bê yasa û zagon jiyaneke xwezayî û dirust bijî ku tê de her kes, her alî erk û mafên xwe nas bike, li cem wan raweste, zêdegaviyan neke. Û eger hat û zêdegavî kir, ew ê sezayê bibîne. Mixabin ku kiryarên dewletên mezin, rêxistina navnetewî qels û lawaz kirine, ew bê rûmet û riswa kirine. Ev yeka han, bûye egera ku serberdayetî li cîhanê belav bibe, û rewşa cîhanê îro bûye mîna ku ji mêj ve Kurdan gotiye: «Zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane!.». Mirovatî, mafên mirov û hûrgelan, parastina jîn û jîngehê, aştî û azadiya gelan û hwd... hemû bê rêz û bê wate mane, hatine jibîrkirin û tu alî li wan xwedî dernakeve, zordestiya reş a çepel pêl daye, konê xwe vegirtiye.

Li ber çavan e, ku îro li devera me Rojhilata Navîn, li Afrîkayê, û gelek deverên din, zagona daristanê ketiye rêya destelatê, tu rêz û rûmet ji gelên piçûk û dewletên qels re nema ye, her hêz, her alî ya xurt, maf dide xwe ku sînorên qelsan derbas bike, gelan dîl bike, bêyî ku ew li hemberî dadmendiya navnetewî bêne darizandin û sezaya tewanên xwe bibînin!. Wekî çawa ku îro welatê me Sûriyê ji dewletên mezin re bûye gastîna şer, bûye gola xwînê, welatiyê wî têne kuştin, agir tê de dilîze û bûye dojeh, civaka navnetewî bi erkên xwe ranabe, vî şerî ranawestîne û vî gelî ji mirinê rizgar nake, naparêze!.

Di rewşeke wiha mij, moran, girik û gemar de, rê û derfet li pêş keftar û koviyên dirinde yên du ling dûz dibe ku ew tewanên mezin bikin, xwîna gelan birjînin, xelkê talan bikin û mirina reş belav bikin!.

Ma gelo îro dewletên mezin ên mîna Emerîka û Rûsyayê, dewletên herêmê yên mîna Turkiyê û Îranê ew bi çi mafî sînorên welatê me Sûriyê derbas kirine, şerê ji bo berjewendiyên xwe li ser xaka me dikin?!. Ma gelo li gora kîjan yasayê dewleta Turkiyê deverên Kurdî li bakurê Sûriyê (Efrîn, Girê Sipê û Serê kaniyê) dagîr kirine, nişteciyên wan ên resen (Kurd) ji cihê bav û kalên wan rakirine, kesên biyanî di malên wan de cîwar kirine û ew li ber deriyan bê cih, bê bask û per hiştine, mişext û penaber kirine?!..

**Dost û hevalê min ...**

Ez baş dizanim ku dilê te bi rewşa gelê te yê Kurd ve girêdayî ye, ger rewş baş be, dilê te şad e, ger xirab be, ew jî xemgîn û bi girîn e. Lê, weke rastiyekê ji te re bêjim, rewşa me ya îro bi her hawî xirab û ne baş e!... Mixabin ku hêzên me yên siyasî, ne li gora vî barî û vê serdemê ne, ev rastî çiqasî tal be jî, lê ew li ber çavan e, tu kes nikare wê bide mandelê. Ta vê rojê ku nîvê welatê me hatiye dagîrkirin, yê mayî jî di bin metirsî û gefê de ye, hê jî tevgera me nakokiyên xwe jibîr nekirine, bernedane, tenê carekê ji bo doza vî gelî civîneke hevbeş lidar nexistine, hevdu nepejiandine!... Her aliyek li singa xwe dixîne û dibêje «ez», û yê din dibêje «tew ji xwe ez»!!, di nava vê ezîtiya malwêran de, gel ji xaka xwe tê qewitandin, pilanên hilkirin û tunekirina wî birêve diçin!!..

Lê, tevî vê rewşa me ya xirab, gelê me bê hêvî nabe û her ew ê têkoşîn û xebatê bike, herwiha mirov bawer e ku xêrxwaz û têkoşerên dilsoz ên vî gelî ji bo manê û bidestxistina mafên wî, dê xebatê berdewam bikin, ew xebata wan a îjdil, dê rûreşiya xwefiroşên ku rastiya xwe di bin saloxan û perdeyên derew de veşartine, ji gel û dîrokê re aşkere bike!.

Li dawiyê, dixwazim bêjim ku ev bêdengiya berpirsên civaka navnetewî li hemberî êrîşên hovane yên qirkirinê ku dewleta Turkiya dagîrker û patoxwerên wê .....

❻

# Efrîn di bin dagirkeriyê de ye (76):

## Teqîna otombîlekê û pakrewanbûna sêvîlina... Desterkirin û girtinên bêsûc, bi karanîna hemwelatiyan û qewtandina xoceyê mizgeftekê, pêşdelivandina sînor

<u>***Wergerandina ji Erebî***</u>

Destlatdariya Anqerê herdem dibêje ku navçên di bin destlata leşkerên wê de aramî peyda ye, lê bûyerên tal û kambax ên hene derewîna wan kifş û tazî dikin. Li herêma Efrînê ya dagîrkirî, lawên wê û bi taybetî yên ciwan ji tirsa girtin, revandin, lêdan, dizîn an bûyereke çêkirî - ger ne gerek be - nikanin kînga xwestin li nav gund, bajarok û berve navenda bajêr ve herin û werin weke ku di zîndaneke mezin de bin, bi ser de jî tunebûna parastina arzî, mal û milkan û redkirina setemkariyan. Herweha bûyerdana teqînan bi şêweyên cûrbecûr herwext di nav sêvîlan de, ewên ku imzeyên terorê û rêxistinên tekfîrî û tundrew hildigrin û di paş de jî alîne ku armanc û berjewendiya wan tenê berdewamiya fewdalîzim û serberdeyatiyêûkoçberkirin û derbederkirina hejmareke zêde ji xelkê herêmê yê Kurd e. Lê,hercar destlatên dagîrker (yekîneyên kurdî) bi lez û bê nişaninan an lêkolînine zelal berbiçav bikin, tewanbar dikin. Weke ku çawa li vê dawiyê şalyara bergiriyê ya Turkiyê ji bo teqîna sîtêra mazotê ya li siba 10 ê Reşmeha 2020an li navenda bajarê



Efrînê daxuyankirî û dîsa (hêzên kurdî) pê tewanbar kirî. Hêjaye were diyarkirin ku ew teqîn li orta bajêr, kolana Reco û li pêş firoşxana Fetayêr Mîlano bûyer da, agirikî mezin û pir gur û hêgin vêket, ziyanine şênberî mezin gihîştin firoşxanan, avahî, makîneyên derdor, 11 kes birîndar bûn û 6 şehîd (pakrewan) bûn, ji nav wan şehîdan Henan Ebdo 53 sal, kurê wî yê tekane Ebid Elreman 13 sal û Cangîn Mihemed Ebdo 32sal ji gundê Husê yê girêdayî navça Mabeta, û nivîsgeha tenduristiyê ya Efrînê diyar kir ku Semhan Elon ji Xanşêxûnê, Raêd Etal ji Helebê û mêrekî bê nasname bi wê teqînê hatin kuştin. Ji bîr nebe ku çawa piştî her teqînekê yan ketina avêjtokan, çawa tirs û xof di nav hemewelatiyan de peyda dibe û ta çend rojan xelk ditirse ku ji malên xwe derkeve, û bi ser ku kamîreyên çavdêriyê li hemî kolan û zikakan belavkirî ne, dîsa jî destlatên dagîrker nikanin ên ku van teqînan dikin nas bin û diyar bikin, yan jî nas dikin lê naxwazin diyar bikin ji ber ku di nav riyên wan de ne.

Girtin û desteserkirin li herêmê berdewam e. Li gundê Kanîgewrikê yê girêdayî navça Cindirêsê, hemwelatiyê bi navê Alan Mihemed Ebdo, li 6 î Reşmehê hate destserkirin, piştî wê bi rojekê birakê wî Xelîl hate girtin ji ber lêpirsîna wî li birayê xwe û ta niha jî çarenûsa wan ne diyar e.

Hemwelatiyê ciwan Izedîn Cemal Şêxo ji gundê Omo yê girêdayî navça Mabeta berî niha bi salekê û sê heyvan ji aliyê milîsên Sultan Mûrad ve desteser bû û ta vê kêlîkê çarenûsa wî jî ne xuya ye.

Piştî ku asayişa leşkerî û istixbarata Turkiyê bi ser gundê Gemrûkê yê girêdayî navça Mabeta ve cûn, herdu xort Cîhad Ibrahîm kurê Hesen û şiyar Mihemed Mustefa girtin û piştî du rojan berdan. Gundê Sêmalka jî, li 2 î Reşmehê ji aliyê milîsên Sultan Mûrad ve desteser bû û ev hemwelatiyên wê, hersê bira Ednan û Ehmed û Mehmûd kurên Hemîd Mihemed hatin girtin û piştî lêkolînê hatin berdan, herweha herçar bira Idrîs û Ibrahîm û Esmet û Hemîd kurên Mustefa Hemîd hatin girtin û işkencekirin, Esmet ji ber tenduristiya wî ya xerab hate berdan û hersê birayên din jî ..... 7

**Hin xalên ... Dûmahîk**

yên Sûrî li ser Kurdan bi behaneya derewîn «Şerê terorê»!!, ew a ku di rastiya xwe de, şerê gelê Kurd e, ew ji dewleta dagîrker a çavsor re rêdan û piştgrî ye, herweha, ew ji bo vejîna rêxistina terror «Daiş» û hevalbendên wê re dibe derfet û xelateke zêrîn, da ku careke din ew xwe birêxistin bike, kînê, ramana reş û mirinê li cîhanê bi tevayî belav bike, hemû gelên cîhanê, dê baceyeke giran bidin. Wê demê, ew ê li vê bêdengiya xwe ya hemberî fermana Kurdan polî poşman bibin, tiliyên xwe gez bikin, lê poşmanî bê sûde ye!...

**Gelek sipas...**

**Efrîn di ... Dûmahîk**

ta niha li navenda navça Bilibilê girtî ne.

Lê, gundê Gobeleka yê girêdayî navça şera ji 55 malan pêk tê, 25 mal ji hemwelatiyên resen ji Avdara 2018an de, vegerîne ser cî û warên xwe û 80 ê mal ji yên nû anîne li gund bi cî kirine, hemwelatiyê bi navê Mihemed Horo kurê Kemal ê 30 salî û bavê sê zarokan destserbûye û ji Nîsana 2018an ve hatiye veşartin û çarenûsa wî ne zelal e.

Li gundê Kotana yê bi ser navça Bilibilê ve, ji 11 ê Reşmehê ve, ev hemwelatiyên temen mezin, Sefer Ehmed Çolaq 70 sal, Ednan Mihemed Hesen 50 sal hatin girtin û piştî dandina cezaya 150 hezar kaxes sûrî ji ber her yekî ve, hatin berdan.

Di çarçewa belavkirina çanda cîhadîst ya osmaniya nû de û dorpêçkirina kar û barê xoceyên «Îmam el_xetîb» mizgeftan û karanîna olê di siyaset û karên leşkerî de, serkêşê milîsa «lîwa 112» li bajarokê Badîna û li ber roniya biryara Istîxbaratên Turkiyê, li roja Pêncşemê 13 Reşmehê xocê gund, şêx Ebid El_rehman Ramûsê (bavê Mihemed) bi sedema ku navê wî di lîsta wan a xoceyan de tune ye hate qewitandin. Divê bête zanîn ku xocê rêzdar bêtirî carekê hatiye lêkolînkirin, dizîna kelûpelên baqirî yên mizgeftê yên taybet bi şuştina miriyan, tabloyên ênerciya royê yên eletirîkê û betariyan û amûrên denghêziyê ji aliyê milîsên çekdar ve dema derbasbûna wan nav gund şermezar dikir û wî di gotara xwe ya hefteyî li rojên Înan karûbarên wan ên qirêj ji dizîn, talan û zordariyên civakî di dermafê xelkê sêvîl de riswa dikir û dicerisand. Ji bîr nebe ku bavê Mihemed ji xelkê gundê Şehbayê yê Bakurê Helebê ye, 20 salan li ser daxwaza xelkê gund û ji kîsî wan li wir xizmet kir, ciyê rêz û heza piraniya wan bû û wî bi xemgîniyek mezin û hestên nerazîbûna gundiyan xatir ji wan xwest, û ji bîr nebe ku mala wî ya li Efrînê jî li Havîna 2018an hate dizîn û xerakirin.

Li 13 î Reşmehê, serkêşê milîsa «Siqor El_Şemal» li 10 hemwelatiyên gundê Bêlê yê girêdayî navça Bilbilê zorkir ku Tiraktorên xwe bi behana ku wan av jê re nanîne_ radestê bikin û dema yek ji wan ji ber barana berfê li şûn ma, serkêş tekerên tiraktora wî gulebaran kir û xwediyên tiraktoran bi tirs in ku da ku berdin pere ji wan werin xwestin, weke ku çawa li gundê Qirigolê yê bi ser Bilbilê ve mlîsên «Sultan Mûrad» li xwediyên tirektoran zor dike ku ava vexwarinê ji xelkê ku hatine niştecîkirin re - bê pere - peyda bikin. Herweha ji bo wan destên xwe jî dîdinin ser êzingên hemwelatiyên gund û hin endamên wê ji salekê ve - du carin - derin mala pîrejineke gund a bi navê Sedîqe Elî û peran û hinde kelûpelên wê yên bi nirx jê didizin.

Li aliyekî din, Hikometa Turkiyê li dirêjiya çiyayê bi ser gundê Zerê- Bilbilê ve, ji bo leşkerê xwe kanibe bi hêsanî çavdêriya deverê û kontirolê bike, dora 300 m sînor bi aliyê Sûriyê ve, pêş de daye, yanê sînorê fermî derbaskirî.

Tiştê barê xelkê Efrîn hîn giran dike, niştecîkirina bi sedhezaran ji koçberan û malbatên çekdarên milîsên sûrî yên girêdayî Turkiyê, di nav mal û milkên xelkê û li ser hesabê mafên wan û li rex bindestkirina bi hemû cûreyan, bi armanca guhertineke demografî bi rêk û pêk ji aliyê destalatên dagîrker ve ye. Û ta niha jî karwanên koçberan berve Efrînê diherikin, di dema ku bêtirî 200 hezar ji nişteciyên Efrînê yên resen ji çarêka yekem a sala 2018 an ve, bi zor hatin bi derxistin û li gundên Şehbayê û hin gundewarên bakurê Helebê û li hundir Sûriyê û welatên der ve hatin derbeder û mişextkirin.

15.02.2020an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

# Silavname

**Hevserokên giştî yên partiya demokratîk a gelan; Xanim Pervîn Buldan, birêz Sezayî Temellî…**

**Mîvan û endamên kongireya 4.emîn a partiya demokratîk a gelan…**

**Beşdarên giranbuha…**



Silavên gerim ji Sûriya birîndar ji we re hene, bi hêviya ku, kar û barê xebata HDP-ê ya dîrokî û rewa, her li pêş û serkeftî be.

Lidarxistina kongira we di van şert û mercên nazik û dijwar de, navnîşaneke balkêş û pîroze, û bawerî li cî ye ku, cefakêşî û têkoşîna HDP-ê bona Aştî, Azadî û Wekheviyê, her dê berdewam ciyê piştgirî û rêzgirtina hemî Aştîxwazan be.

Heval û hogirên partiya me PYDKS we hemiyan silav dikin û bi dil û can serkeftinê ji kongireya we re dixwazin.

Qamişlo 20.02.2020an

**Birayê we**
**Mihyedîn Şêx Allî**
**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

# Kobanê nas bike




**Arif Hisso**

Li gor amarên ku di dest me de hene, di sala 1912 an de Kobanî hatiye damezirandin, dema ku kombaniyek biyanî li wir bi çî bûbû û riya hesinî çêdikir, ji Berlînê ta Bexdayê. Navê wê ji kambanî hatiye .

Heta sala 1936ê, Kobanî girêdayî herêma Cerablusê bû, ji wê şûn ve, ew ji Cerablusê cuda bû û du bajarokên piçûk Sirrîn û Şiyûx pêve digel 400 gundî ku 120 jê girêdayî Sirrîn û 60 gund girêdayî Şiyûxê bûn pêve hatin girêdan,

Li gora serjimara fermî ya sala 2006an, nişteciyên Kobanî 350000 mirov in û firehiya xaka wê 2800 km2 çargoşe ye. Kobanî bi çandina Genim, Ceh, Nîsk, Nok, Pembû û Kemûnê navdar e, û di warê pîşesaziyê de jî ew bi çêkirina alavên Cotkirinê û Xerazan pir pêşve çûye, ta radeya ku alavên wê gihiştine dewletên biyanî yên dûr.

Êl û gundên Kobaniyê ev in:

1. Bıjan : Mirşid bînar - Qereqoya jorîn - Qereqoya jêrîn - Cipil ferec - Derb bazin - Tehlik - Zerik - Gola qul - Minaz - Korik - Mewçik - Sitî - Yêduqyî - Kulmit - Termik - Zerkotek - Mamît - Qurof - Termîka bîjan .

2. 2- Dîdan : Piraniya va êlê lin gundewarên herêma Babê dijîn lê gundê wan li Kobaniyê ev in : Qiran - Mizir amûd - Mezra biçûk .

3 - Ox û şedad : Ev gund li rojhilatî kobaniyê dijîn û pêtir li ser sînorî Turkiyê û hin gund girêdayine parêzgeha Reqê ew jî ev in : Kazikan - İtwêrana jorîn - Bexdîk - Îdaniyê - Mitkelt - Xerabnas - Gultep - Cirnê reş - Bîra ereban - Serzorî - Amed baş - Derbe hesen - Korik .

4- Şêxan : Gundên şêxan ev in : Mizr dawid - Kêfûn - Qertel - Kortik - Horik - Qûçik - Reqasî jorîn - Reqasî jêrîn - Qazanî - Gola ketî - Toqlî - Minîfî kor - Xersb işk - Derflît - Mîl - Tehtika jorîn - Tehtika jêrîn - Qebeciqa mezin - Qebeciqa biçok - Welaqî - Qazanî - Çelebî - Gogteba pêşîn - Gogteba paşîn - Şeş - Şarebanî - Girik - Hêrik - Ûç qardaş - Bozîka jêrîn - Bozîka jorîn - Dafiyé - Xurxure - Metîn - Minîf - Mizxene - Hemdûn - Cîl - Mendik - Tolik - Sal - Termik - Xanka avdo - Xanka xeliyan - Dal silam - Beşik - Xerab sarûnc - Xerab rast - Garoz - Hemamik - Şêx bekir - Bîra emer - Solan - Zuxir - Cind - Taşloka jorîn - Taşloka jêrîn - Tilik - Şêx alî - Erebşeh - Gocekmêt - Seferî - Xan mihemed - Qeynter - Cilod .

5 - Kêtkan : Gundên kêtkan ev in : Qişle - Xilomer - Qil hedîd - Babaroş - Norelî - Eslankoyî - Omelek - Girik - Çort - Moman ezo - Kepirepin - Sîçiklî - Heyalê - Kewrik hebîb - Boxaz - Qumçî - Zelxik - Berxbatan - Zerîk - Merza sofî - Xatonî - Zorava - Siftek - Karspîç - îşkeft - Dolîdax - Boban - Sûsan - Qule - Mixarac - Til xezal - Şêx copan - Kofî - Îtwêran - Elem - Aşme - Dîkmedaş - Çarqlî - Kuneftar - Gird - Ziravik - Bîrqadir - Donxizê biçûk - Donxizê mezin - Gewrik - Xêzênî - Tefşo - Rovî - Berkel .

6- Ělêdîn û mehef : Gundên wan jî ev in : Mişko - Hec imayil - Zekerî - Boraz - Qasimiyê - Çeqel wêran - Meydan - Quşiliya jorîn - Quşliya jêrîn - Bîr mel - Zinarê qul - Bendirê jêrîn - Bendirê jorîn - Bendirê oretê - Sêv elî - Hinguş - iwênî - Şem - Biling - Dadelî - Qurdîn - Qine - Xerab kort - Xerab bal - Helinc - Şêran - Cêlik - Xerab mûs - Bestik - Êleçax - Degirman - Diwěrat - Qor - Çixur .

-----------------------

Têbîn : Eger hin çewtî hebin, hêvîdar im hûn ji me re serast bikin .

## Li Qamişlo Çilrojiya Heval Hemze Hesen (B.Ciwan )



Di 172020/1/an de, li hola Silêman Adê û bi amadebûna heval, dost û malbata nemir, rêxistina Qamişlo ya P.Y.D.K.s bi boneya çilrojiya koça dawî ya heval Hemze B.Ciwan, ev çalakî lidar xist.

Heval hemze B.Ciwan sala 1955 li gundê Xirbesûgiya jidayik bûye. di destpêka xortaniya xwe de, ew tevlî refê tevgera kurdî bûye. Li sala 1990î di dema «MULSEQATAN» de hatiye binçav kirin; ji ber ku hevalekî çalak bû ji bal rêxistina xwe ve hate xelat kirin.

Careke din, bila cihê heval B.Ciwan bihuşt be, serê heval, dost û malbata wî sax be.


# Du hendesyarên xezal ji Bafilûnê, du demên dîroka Kurdaxê ne

**Mamed Cimo - Parîs**

Bafilûn, gundekî Çiyayê Kurd e, bi navê xwe navnîşana Filleyên dema Bîzantî li ser e, hema nişteciyên xwe îro Kurd in. Gundê Bafilûnê nîşana ferhenga Roavaya Ewrupî û ya Rohilata Arî ku bi hev re bûnî yek e, rûyê rewşa siyasî û dîrokî ya navçê ya wê demê tê de diyar dibe, berî ku hên were bisilman kirin. Ev dîroka hevbeş a Roava û Rohilat bi hev re li Kurdaxê, bûye hêvanê şaristaniya navçê. Pê re, dagirtin û hêrişên Bisilmana navçe kavil kirin û berdan. Piştî wê, Peymana reş a Sykes-Picot Kurdax û Bafilûn ji Kurdîtiya wê bêpar kirin; êdî Kurd bê gav dibin ku debara jiyanê û birêvebirina demê di Dewleta Sûriyê de bikin.

Hendesyara Yekê, Zêneba Îbo: Sala 1973, çend keçikên jîr ji Efrînê di xwendinê de pêşketî bûn, rabûn, gihane sefa Nehan, Nehname wergirtin, lê dibistan ji bo xwendina keçika li wir disekinî. Ji bo berdewamkirina xwendinê, bavên çar keçikan ji wan xwe dane hev (Osman Îbo : şûfêrê makînê; Bekmes : xwediyê dukana sola; ‘Arûda : xwediyê dukana gelemperr; ê çarê : ?) û berê xwe dane Şamê ji bo wezîr bibînin û daxweza vekirina dibistaneka keçikan bikin. Bersiva wezîr bi henekî ji wan re hat : « Herrin, bila keçikên we dirûnê bikin û bibine jinên malan…!!! ». Sala 1974, dibistaneka keçika ya yekê li Efrînê hate vekirin. Hendesyara





Dudiyê, Mîdiya Îbo : Êdî, têkoşîna gelê Kurd di warê netewperestiyê de gavên girîng avêtin, dergahên Birca Belek a Kurd, dergahên Mêdiya, û direfşa kawayê hesingerr li ser banên wê, diyar dibin. Keçikên mîna Mîdiya êdî dergahên Azadî û Serxwebûna wê dewletê dikutin.

# Li BONê Ji bo arîkariya penaberên Kurd li Sûriyê Pêşangeheke hunerî



Roja 1ê Berçile ya 2019an, Navenda Kurd a Lêkolîn û Şêwermendiyên zagonî(YASA) û Komela Hunermendên Kurd»Reng Art», li bajarê BONê, bi hev re, pêşangeheke hunerî pêk anîn. ji bo firotinê, gelek tabloyên nirxdar û sipehî têde hatin raxistin. Û da ku nirxên tabloyên firotî ji penaberên welêt re bên şandin, Komîteyek hatibû damezrandin. Gelek alavên ragihandinê ev bûyer ragihandin û jê re propaganda kirin.

Tişta balkêş ew bû ku hunermenda Kurd Fayize Can Arif ku hunermendeke Kurd a bajarê Silêmaniyê ye, bi temenê xwe yê 76 salî ji Hanoverê hat û beşdariya vê pêşangehê kir.

Hêjayî gotinê ku ragihanderê Kurd birêz Sêrwan Hec Berko, ji bo arîkariyê 3 tablo kirîn.

Ji ber hezkirin û piştgiriya Kurdên Rojavayê Kurdistanê, Hunermenda çalak û zîrek Fayize Can, rojnameya NEWROZ ku yek ji rojnameyên bi zimanê Kurdî yên Rojava ye, bi rêzgirtin hembêz kir.

Ji bo vê xebata pîroz, mala Hunermendên me ku girêdayî derd û kulên gelê xwe ne û Navenda YASA ku bi hemû hêza xwe berevaniyê di ber doza gelê xwe ya dadmend de dike, ava be, û em destxweşiyê ji we çalakvanên hêja re hêvî dikin.



# Termê Qaçax

**Osman Îso**

Dr: Divê win nexwaşê xwe rakin û bilez bibin Tirkiyê yan Helebê... Çare li ba me nîne... Ew şêtûmêt dimînin, dest û lingên wan têne girêdan, lê ew neçar dibin, nexwaşê xwe dibin mal, û di nav pêlên dudiliyê de melevaniyê dikin, û di orta du rêyan de hatine parvekirin; her du rê dijwar in û di bin destên çeteyan de ne, her du rê gava bihna peran dikin gilêz ji devî wan diherike, û asta mirovahiyê nizim, nizim û nizim dibe, û asta hovîtiyê bilind, bilind û bilind dibe; her du rê cefayên salan ji berîka te rêş dikin û bi ser de rûmeta te jî melûl dikin, û çavên serbilindiyê bêzar dikin... Malbata ku sêrib li Ewrupa ne û ribek jî li welêt maye, li hev civiyan, û piştî danûstandinê biryarek standin; wê nexwaşê xwe rakin Helebê tevî metirsiyên li ser rê, lê ew ji rêya Tirkiyê baştir e, û eger nexwaş li Helebê mir, laşê wî bi temamî û bê kêmasiya endaman wê bin ax bibe, lê nexwaşxaneyên tirkiyê mişt qirik in, qirik in awerte ne, laşan ji hundir ve vala dikin û didirûn û dikine tabûtên oflaz û ji te re birêdikin. Malbat gerî û pirsî, û li dawiyê wan qaçaqciyek dîtin û gelekî berhevdan li ser rê û li ser peran, lê gava tu dibînî giyanek tê şewtandin bi agirê kul û êşan tu bi hemû tiştan razî dibî, bes bila aramî û saxlemî vegere û giyan ji nû ve şax bide, û gupikên ken carek din vebin û bihna şahiyê belav bikin. Li nîvê şevê ji mal derketin û berê xwe dane Helebê... Otombîl rêyên qaçax dadiqirtîne û gava rastî gelek rêbendan tê, ew dev û çavên wan mişt pere dike û ew derbas dibin, û piştî roj û şevek ji temênê wan, mîna deh salan kêm dibe û gelek pere ji berîka wan diherikin, û alozî û astengî xwe di aramiya wan werdidin, ew derbasî Helebê bûn... Nexwaşê xwe di nexwaşxaneyeke taybet de bi cih kirin (şev bi 12000 L.S, bes xewkirin, ji bilî dermên), te digot qey Hotêleke bi pênc stêrkane



5*... Roj şepelkûrkî diborîn û berîk di xwe de diqusqusîn û dinalîn, û yawaş yawaş geşbûna wan dadirvî û qelewbûn ji wan direvî, û bi ser kul û derdan de pêşketin û tenduristiyê her dem xwe didane alî û çav li revê bûn û nedixwastin vegerin laşê bêkes û belengaz. Bijîjk li gorî zanîna xwe wî derman dikin lê rewşa tenduristiyê paş ve diçe û nexwaşê perîşan dadirve û rojên temenê wî diqujmirin... Wî dawiya xwe baş nas kiribû, loma gote birayê xwe: Keko eger ez mirim min li Efrînê bin ax bikin... Du sê roj derbas dibin ew dere ser dilovaniya Xwedê... Birayê wî dixwaze xasteka birayê xwe bi cihê wîne û termê birayê xwe vegerîne Efrînê û bin ax bike... Lê çawa ?? Belge gerek in û destûr, rêdan û îmze jî nîvî temenê te dibin... Nêzî heft rojan birayê belengaz li deriyan vedipeke, ji va derî dişînin wa derî û bê sûde û bê encam... Berpirsiyar rêdanê nadin, ji bo bira termê birayê xwe vegerîne Efrînê... Ew neçar dibe, wek çawa bi rêya qaçaxan hatin Helebê dîsa bi wa rêkê vegerin... Qaçaqciyekî dibînin û wî bi sêsed hezar lêre bi razîkirin didin... Û li nîvê şevê termê seqamgirtî ji nexwaşxaneyê dikin Tabûtê û li otombîlê sîwar dikin... Û dikevin rêya vegerê... Lê berî ew bi rêkevin xwediyê nexwaşxaneyê /30000/L.S ji ber heft rojan ve ji wan xwast... Hevalê birayê belengaz ji hêrsa re dibêje: Yanê we firavîn, taştê, şîv û paşîv dida rihmetî ??!!

Belê term bi qaçaxî vedigerînin Efrînê û bi dizî tê pêşwazîkirin....

Di vê cenga bênamûs de termên Efrîniyan bûne Efyon... Çiqas zor e term bi qaçaxî vegere axa xwe!! ...

# Civata salan e ya S.F.P.Z.K.S

Civata salane ya «Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî - şaxê Cizîrê, roja 03.01.2020 an li hola Silêman Adê ya bajarê Qamişlo li dar ket.

Civat bi navê «Waşokanî» û di bin diruşma ‹Zimanê me hebûna me ye›› de bi rê ve çû.


Nûnerên komîteyan tekez kirin ku her dem û li her cîwarî guhdana li zimanê kurdî pêwistiyek e, her weha dê her karê di ber ziman de, biçûk be yan mezin be, bi encam û berhem be.

Di dawiya civat, de komîteke rêvebir ji saziy, re hate hilbijartin.

# Weşanên nû

**Nîzar Yosef**

Çap a duyemîn, berhevok a min - Rêwî yê xewna efsûnî - li çapxaneya sersera, bi alîkariya xwedanê wê Dr.Beşar Mistefa hatiye çap kirin. Naverok a pirtûkê ji helbestên nûjen û klasîk pêk hatiye û xemiliye. Lêveger: lêvegervan seyda Heyder Omer. Amadekirin a bergê: Mehmet Ûnver. Tablû yê bergê: Nizar Yosif. Derhêner ê pirtûk ê: Seyda Idrîs Omer. Çap a yekemîn: Payîz a 2008an. Çap a duyemîn: Payîz a 2019an.




**Li Qamişlo ... Dûmahîk**

bin dagirkeriya hovên serdemê de dinale, ta Kobaniya berxwedêr, Girê Sipî û Serê Kaniyê, ya ku di bazarên rûreşan de li ser destê bazirganên siyasetê, bi darê zorê ew ji xwediyên xwe hatine standin û biyanî lê cîwar bûne, ta devera Cizîrê, birêz Kemal Henan weke xebatkar, rewşenbîr û siyasetmedarekî dilsoz dihate naskirin û ew cihê rêz û rûmeteke giran bû…

Di vê bîranîna xembar de, bi navê Desteya weşana we NEWROZ, em xweşmêr, lehengê çand û pênûsê, xemxurê doza gelê xwe, xwediyê gotara aştî û mirovahiyê bi stuxwarî bibîr tînin û bejna xwe jê re diçimînin û gurzek Gul û Nêrgizên Çiyayê Kurmênc diyarî giyanê wî yê pak î pîroz dikin.

Li dawiyê, baweriya me di Desteya NEWROZê de ew e ku tevî hemû reng û cureyên azaran, tevî dagirkeriya malwêran û derberiyê, tevî birînên me yên şil ku hêj qeşmûşk negirtine, tevî ku hêj hişê me baş nehatiye serê me, û me dost û dijminên hebûna xwe ji hev cihê nekirine jî, lê, em bê hêvî nabin….Em bêhêvî nabin û em bawer in ku ji bo doza gelê me ya pîroz her dê kar û xebat berdewam be, û serkeftin ji gelê me re ye!

Serê gelê Kurd, hezkerên zimanê Kurdî, malbat û xwendevanên zimanê dê sax be.

--------

Piştî gotina NEWROZê, mamoste Canda Erefat, gotina **Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê(SFPZKS)** pêşkêşî beşdaran kir, li jêr, deqa wê ye:

Despêkê em spasiya beşdariya we tevan dikin û spasiya malbata Bavê Şiyar dikin ku em vexwendin vê boneyê, boneya bîranîna roja koça dawî ya mamosteyê nemir M. Kemal Henan Bavê Şiyar ku di 31. 1. 2013 de çeka dijmin ya xedar ew ji nav dost, malbat û heskirên wî bir.

Bavê Şiyar welatperwer û heskerê welat û miletê kurd bû û jiyana xwe zêdeyî 40 salî di ber mafê kurd de borand, hemû hêz û xebata xwe ji bo xizmeta zimanê kurdî terxandibû û nifşek di pey nifşekî re fêrî zimên dikir.

Bavê Şiyar ji bilî ku rêveberê ragihandina partiya xwe (Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li sûrî) li Helebê bû, damezrênerê S.F.PZ.K.S jî bû, herweha ji bo belavkirina çand, ziman, wêje û hizra kurdî di kovarên Pirs û Gelawêjê û di rojnameya Newrozê de dixebitî.

Em wek endamên k.Nefel ya S.F.P.Z.S em ê li ser şopa nemir Bavê Şiyar di fêrkirin û parastina zimên de berdewam bin.

Koça wî jidestçûneke mezin bû ji me tevan re, divê em wî ji bîr nekin û di şopa wî de berdewam bin.

Serê dost, malbat û heskerên Bavê Şiyar sax be.


k.Nefel ya saziya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Sûrî.

--------

Kesayetiya welatparêz û naskirî birêz **Emerê Ebdikê »Bavê Teymûr»** ku yek ji hevalên pakrewan bû û bi hev re di serkirdayetiya Partiyê de xebat kiribûn, gotina hevalên şehîd devkî pêşkêş kir, li ser dilsozî, çalakî û hişmendiya birêz Kemal axivî, çawa ku ew xemxur û dilêşê doza gelê xwe bû, ew li berjewendiyên xwe rojekê negeriya bû, ji hevalan re mala wî li Heleb û Efrînê her vekirî bû, mîna navendeke Partiyê bû. Di dawiya gotina xwe de got ku ew ê li ser şop û baweriyên ku pakrewan canê xwe daye, ta pêkanîna armencên gelê Kurd ew ê birêve herin.

Li dawiyê, hevjîna pakrewan, xwişka **Fatma Diya Şiyar**, gotina malbatê pêşkêş kir. Ji bo beşdarî, cefakêşî û wefadariya hevalên Kemal, sipasiyên xwe pêşkêş kirin û got ku Kemal zindî, di nav hevalên xwe de dijî, û her ku ew hevalên wî dibîne, partiya wî xurt û li ser hev dibîne, ew ji bo paşeroja Kurdan geşbîn dibe, û hêviyên xwe anîn zimên ku sala bê, ev bîranîn li ser gorna wî bibe.

# Li Qamişlo Pakrewanê raman û pênûsê KEMAL HENAN Hate bibîranîn



Dûrî Efrîna dagirkirî, dûrî gundê Tillif ê ku gora nemir Kemal lê cîwar e, roja Înê 312020/01/, rêxistina Qamişlo ya PYDKS 7emîn bîranîna terorkirina wî, bi beşdariya malbat û birek hezker û dostên wî bibîr anî.

Piştî ku birêz Arif Hiso ku yek ji dostên nêzîk ên birêz Kemal bû, xêrhatina beşdaran kir, û xuleyeke bêdeng, gotina pêşîn da mamoste Mustefa Meşayix/Cîgirê sekreterê PYDKS.

Di axaftina xwe de, kekê Mustefa got» gerek bû me ev bîranîn li ser gorna wî li Efrînê, bi beşdariya malbat û gundiyên wî sax bikira, lê sed mixabin ku ji ber dagirkirina malwêran a Efrînê, me nikarîbû wî karî bikin». Paşê, li ser rola wî di warê xebata siyasî û wêjeyî de axivî, û li ser bandora wî di geşebûn û belavbûna Partiyê di piraniya gund û bajarên Efrînê de bi firehî anî zimên. Û ji ber ku ew endamê komîteyên gelek weşanên Partiyê çi bi zimanê Kurdî û çi yê Erebî bû, çûna wî ji partiyê, gel û malbata wî, tevgera Kurdî û ya netewî Sûrî bi tevayî re, ziyaneke mezin bû. Herweha got» em bi hêvî ne, sala bê, piştî rizgarkirina Efrîn , Girê Sipî û Ser Kaniyê, em Kemal li gundê wî bibîr bînin, ji ber ku heta deverên Kurdî yên dagirkirî li xwediyên xwe venegerin, penaber venegerin ser xaka bav û bapîrên xwe, birîna dilê me sax nabe». Paşê, bi firehê birêz Meşayix li ser rewşa siyasî li welêt û deverê axivî.

Pişt re, kek Newafê Bişar gotina Weşana NEWROZ a ku birêz Kemal Henan yek ji endamên komîta wê û paşê berpirsê wê bû, ev e ye deqa wê:

**Pakrewanê raman û pênûsê KEMAL HENAN her zindî ye!**

Di jiyana siyaset û rojnamevaniyê de, roja 31.01 2013an, roja dawî ya meha Çille, dawiya şahî, hêminî û bexteweriyê bû!…Di vê roja reş a bêqidoş de, li taxa Eşrefiya Helebê, bi guleyeke kîndar, neyarên aştî û azadiyê, dilê xebatkar, rojnamevan û mirovhezê Kurd ê naskirî (KEMAL HENAN) rawestandin…

Bi vê tewana hovane, çanda Kurdî, wêje û rojnamevaniya bi zimanê dê li Sûriyê, û berî hemiyan, weşana NEWROZ a ku pakrewan Kemal yek ji damezrêner, û paşê berpirsê wê bû, hemiyan bi hev re reş girêdan!…

Ji wê rojê ta roja me ya îro, weşana we NEWROZ her xemgîn, melûl, baskşikestî û birîndar e, Deste û xwendevanên wê bi derd û xem in, ji ber ku nema ew wê ronahî û rewşena berê di nava rûpelên wê de dibînin!..

Ji Efrîn a birîndar a ku îro di ..... 11



# Keçên Amûdê Lehengiya jinên Sûriyê ya Goka ling wergirt

Roja Duşembê 27ê Çilleya 2020an, di encama lîstina bi tîma Cermana re li paytexta welêt, keçên Amûda bavê Mihemed bi (3) Golan beramberî(0) bi ser ket, û lehengiya Goka ling a jinan li ser asta Sûriyê bidest xist.

De bila ev serkeftina buha ji xelkên Amûdê, Cizîrê û hemû xelkên Sûriyê re pîroz be, bi hêvî ne ku ev tîm her serkeftî be.



**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**